

MAFÊN MIROV Û DURÛTIYA ZIRHÊZÊN CÎHANÊ



PEYVA WELAT



Mafên mirov û durûtiya zirhêzên cîhanê

Desteya sernivîs

Pîştî şerê cîhanê yê duyem -ku di encamê de bi mîlyonan mirov hatin kuştin- bi dawî bû, Komela Giştî ya Netewên Yekgirtî di 10-11-1948an de afîşa cîhanî ya mafên mirov derxist û pesend kir. Armanç ji vê afîşê ew bû ku rê li ber dûbarebûna komkujîyan dermafê mirovan û destdirêjahiya li ser rûmeta mirov bête girtin, her weha avakirina cîhaneke aştîyane ku hemû mirov û gel têde azad bijîn.

Tê zanîn jî ku hemû welatên endam di Netewên Yekgirtî de li ser vê afîşê imze kirine û pabendiya xwe pê ragihandine.

Bi rastî Afîşa Mafên Mirov bi her 30 bendên wê baştirîn yasa ye û pîroztiyê berhemeke mirovî ye ku eger bête bicîkirin dê dadî û wekhevî li seranserê cîhanê pêkbê.

Lê mixabin, piştî 70 salî ji ragihandina mafên mirov hîn ew maf ji alî gellek welatan û zirhêzên cîhanî ve tene perçiqandin û bînpêkirin, û afîşa mafên mirov tenê maye alavek di destê zirhêzên cîhanî - yên ku desthilatdariya cîhanê dikin- de pê berjewendiyên xwe pêk tînin. Ango dema ku ji wan û berjewendiyên wan re gerek be tê bîra wan, û dema xizmeta berjewendiyên wan neke ji bîr û piştguh dikin û çavên xwe ji ber bînpêkirina mafên mirov digirin, ne tenê wisa jî, lêbelê ew bi xwe mafên mirov bînpê dikin.

Bi vê durûtiya eşkere têkilî ji alî zirhêzên cîhanî ve bi mafên mirov re li ser dirêjahiya 70 salî dibû û heya anîha jî dibe.

Ger em rewşa gelê kurd ji berî 70 salî ve heya îroj bişopînin emê rastiya vê durûtiya cîhanî li ber çavên xwe bibînin.

Kovara WELAT
Çandî- Giştî- Mehane

Sernivîser:
Aras Yûsiv

Desteya rêvebir:
Imran Yûsiv

Dizayner:
Hesen Berzencî



Têbînî: mijarên ku di kovarê de belav dibin, nerîna xwediyê xwe ne û nivîskar berpirsê wê ye

Mafê çap û ji bergirtinê, ji kovara WELAT re, parastîne

ji bo têkiliyê:

welatpress2014@gmail.com

www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

Ji dema ku mafên mirov hatiye ragihandin heya niha, gelê kurd ji biçûktirîn mafê xwe bêpar e, û her ku ev gel rabûye ser piyan û doza mafê xwe kiriye ew rastî komkujiyê hatiye. Bi destê rêjîmên çar dewletan (Turkiyê-Îran-Îraq-Sûriyê) û beşdariya zirhêzên cîhanî bi dehê caran gelê kurd rastî komkujî û bînpêkirina mafên mirov hatiye, herî dawî jî li Efrînê bû, ku rojane em dibînin bê çawa kurd bi destê artêşa turk û kurtêlxwerên wê yên hov tene qirkirin, û çawa jî dewlet û zirhêzên cîhanî li hemberî tawanên wan bêdeng dimînin.

Hişmendiya ku îro desthilatdariya cîhana me dike durrî nîrxên mirovî ketiye, û zagona daristanê dide meşandin, her weha nakokiya berdewam ji bo berjewendiyên ku îro di navbera zirhêzên cîhanî de mezin dibe rê li ber şerekî cîhanîyî sêyem vedike, û hebûna civaka mirovî dide ber gefan.

Ji lewra divê ev hişmendî bête guhertin û mîkanîzmeke hevbeş ji bo cîbicîkirina mafên mirov bête dîtin, bêguman ev yek dê têkeve xizmeta hemû mirov û gelên ku li vê cîhanê dijîn, di heman demê de jî aştî, dadî û wekheviyê dê pêk bîne. ■

تَبْنِي ثَوْرَةَ

adopt a revolution



ALOZIYA MIROVÊ SERDEMÎ

Dr. Ferzende Elî

*Wergerandin ji erebî:
Ciwan Nebî*

Aloziya mirovê serdemî cihekî navendî di çanda civakê de digire, ger dîroka mirov ya ji bo azadiyê, pêkanîna mirovahiyê û armanca jiyane dîroka nakokiyê be, ev nakokî di civaka serdemî de ketiye qonaxeke vebir (civaka pêşesazî ya pêşketî) ku bi guhertinên kûr, di hemî warên jiyane de tê naskirin, bi taybetî hêza gewre ku mirov bi wê şa dibe û kontrola giştî li ser kesan bo wî misoger dike, her wiha awayên kontrola berê ya ku ne hişmendî bû derbas dike, berûvajî kontrola serdemî ku kontrolêke teknoloji û hişmendî ye. Ji vir girîngiya feylesofên ku berşdarî şîrovekirin û vekirina bingeha civaka serdemî bûn û li ser aloziya mirov rawestiyar diyar dibe.

Cîhana me ya serdemî bi reftarên bingeîn tê naskirin, diyartirîn reftar şoreşa zanistî ya teknoloji û prosêsen xwedan berdewamiyêke kûr û fireh e, dibe ku ev her du reftar di şaristanên berê de rolek di rizgarkirina mirov de ji fişarên pêwendiyên gerdişî lîstibin û alavên vehesandinê û jiyana geş peyda kiribin, lê ew mezintirîn hokerên metirsiyê bûn ku gef li jiyana mirovê serdema nûjen xwarin, mirovahiyê ti zordariya şaristanî li ser mirov weke zordariya civaka serdemî nediye, mijara ku girîngiyêke taybet dide doza mirovê serdemî, nemaze aloziya havîbûnê ku di serî de tê, bi awayekî ku aloziya mirovê serdemî di aloziya havîbûnê de kurtdibe, weke aloziyêke navendî û pirgirêk, ku bingeha mirovî ji hêla sincî û derûnî ji hev dixê û kesayetiya mirov tavêje windayiyên biyanî û bê hûde û bê sûde û bê berpirsiyariyê.

Aloziya mirovê serdemî li ser aliyekî ranaweste, ew

xwedan gellek alî ye: Felsefî, abûrî, civakî, çandî û wêjeyî û bi gellek wateyan bikar tê weke: Ligelçûn, talankirin, tiştên, nekarîn, biyanî, bêguhndanî, bêpîverî û bêwateyiyê û li ser civakake bitenê ranaweste, ew aloziyêke giştî û Kevin e, bi qasî kevinbûna hebûna mirovahiyê, ta asteyekê ku hinek wê vedigerînin nivîsên ayînî yên yekem ku havîbûna giyanê mirovî ji Xwedê û di gunehkariya yekem de ku Adem ew kir destnîşan dikin. Gunehkariya ku sedema havîbûna mirov bû, her wiha sedema windakirina xweşiya di buhiştê Xwedayî de bû û ketina mirov di keda dunyayê û zehmetkêşiya wê de.

Bikaranînen havîbûnê corbîcor hatin, her wiha nerînen felsefî li ser, ji felsefeya Yûnanî û felsefeya Serdemên Navîn, ta feylesofên Girêbesta Civakî (Hopiz, Girotis, Lûk û Roso) ta Hîgil, Foyerbax, Markis, dibistana Heyînî û dibistana Firankfortê.

Hîgil, ji nav feylesofên nûjen weke bavê giyanî yê têgeha havîbûnê tê naskirin, bi sedema ku Hîgil yekem feylesof bû ku têgeha havîbûnê, bi awayekî rêbazî û bi mebest di berhemên xwe de, bi giştî bi kar anî, nemaze di berhema xwe ya navdar de (Diyarbûnên hişê tevayî), Hîgil yekem feylesof bû ku têgeha havîbûnê bilind kir pileya girîngiya felsefî weke ku Rêşard Şaxt dibêje. Têgeha havîbûnê, bû têgeheke navendî û cihê gengeşeya gellekan piştî ku Markis berhemên xwe yên abûrî û felsefî belav kirin (1844) (1932). Mijara sereke di van berheman de gengeşekirina Markis bû li ser têgehên havîbûna mirov ji xwe û karê xwe. Markis têgeha Hîgil ya saltkirî bo kar derbas dike, ta têgeha karê jîwariya afirîner û çalakiya bi encam ku mirov bi wê tîkeliyên xwe yên civakî xwe û xweyiya xwe, bi hev girtina li gel cîhanê ava dike.

Ji vir Markis weke pêşengê lêkolîna bi encam bo şîrovekirina têgeha havîbûnê tê

naskirin.

Markis regekî ipirîsim û sosiyolojî da têgeha havîbûnê piştî ku têgeheke mîtafîzîkî û ayînî bû.

Firoyd di nivîsên xwe yên dawî de, nemaze di nivîsên xwe de (Rehtbûnek di şaristaniyên de) û (Siberoja gumanê) li ser aloziya havîbûna mirovî xebitî, her wiha li ser sedem û pêkhatiyên wê yên bingehîn.

Firoyd hevdijiyekê di nav mirov û şaristanê de dibîne, di nav hewildana mirov bo pêkanîna xweziyên wî yên xuristî de, bi awayekî azad ji aliyekî ve û di nav pêwîstiyên civakî, çandî û şaristanî de ji aliyekî din ve, hezkirin ji aliyekî ve şerê berjewendiyên şaristanê dike û ev bi rola xwe ji aliyekî din ve gefan li mirov bi bendkirinên bi êş dixwe û bêyî wan bendkirinan mirov, li gel dahatiyên destnîşankirî nikarîbû şaristana xwe ava bike, her şaristanek pabend e ku xwe li ser zorpêkirinê ava bike, her wiha li ser mandelekirina kewijandinan, bi sedema ku kêmbûn û pêdivî serkotkirinê bi behane dikan. Li gor Firoyd hebûna şaristanekê, bêyî serkotkirinê mijareke neçar e.

Lê li gor dibistana Firankfortê têgeha havîbûnê dibe ku bibe çarçeweke lêvger, li cem wê ramanên hemî feylesofên dibistanê digihêjin hev, yên ku gellek nivîs terxan kirin bo şîrovekirin û gengeşekirina doza havîbûnê, nemaze pirtûka Horkhaymer (Bîrdoza gerdişî û bîrdoza rexneyî) û pirtûka Adorno (Gengeşeya neyînî) û pirtûkên Îrîk Firom (Tîrsa ji azadiyê), (Civaka li ser hev) û (Şoreşa hêviyê) û pirtûkên Hirbêrt Markiyoz (Mirovê xwedî ramana yek alî), (Hezkirin û şaristan) û (Mariksiyeta Sofiyatî). Feylesofên dibistanê, bi nivîsên xwe yên gellek dikarîbûn rengê civaka pîşesazî ya nûjen şîrove bikin, ya ku havîbûn û tiştên mirov, bi awayên corbicor diyar dike, bi sedema desthilatdariya ristên bîrokirat û alavên serkotkirin û zordariya veşartî, nemaze şêwe û awayê belav ji ramyariyê, ku bi navê hişê dezgehî tê naskirin, yan bi hişmendiya teknîkî.

Dibe aloziya havîbûnê, di civaka serdemî de nexweşiyêke giştî were dîtin, li hemî diyarên û

têkeliyên mirovî dixe û lihevkerina di nav civaka serdemî û pêdiviyên taybetmendiya mirovî de ji nav diçe, bi sedemaku di sîstema kapîtal de mirov nema hêviyek e bo xwe, ew dibe alavek bo hinek hêviyên din, di encamê de tenêtiya mirov bêhtir dibe, her wiha biyanî û bitenêbûna mirov li hemberî hêzên abûrî yên kor, lewra tekaneya mirovê nûjen dibe bitenê gumanek, ji ber ku serkotkirina hemî hestên jixweberî û pêşketina tekaneya resen di qonaxeke zû de ji jiyana zarokan dest pê dike, di rêya saziyên perwerdeyê yên şaristanî de, ku li ser zarokan hest, nerîn û xweziyan, bi gellek rêyan ferz dikan, rêyên di nav gef û sezayan de ku zarokan ditirsînin û di nav alavên bertîlê de, tiştê ku dihêle zarok ji hestên xwe dakeve û ji hestiyariya birastî bi xwe jî.

Ev havîbûna xweyî sîka xwe tavêje li ser hemî têkeliyên mirovê serdemî, girêdana kes bi yên din ve dibe girêdaneke pabend û otomatîk û ezîtî, bi ser havîbûna kar û berhema wî de û têkeliyên bîrokiratî û awayên peykerî yên nûjen, weke koletiya hêzê û desthilatdariya bazar û serkeftinê.

Ango havîbûn di civaka serdemî de giştî ye: Dikeve di nav têkelîya mirov bi kar re, her wiha di nav têkelîya mirov bi tiştên ku wan berhemxur dike re û bi dewletê û xwe û kesên din re.

Rengê havîbûnê yê herî nûjen û belav di civakên serdemî de havîbûna berhemxuriyê ye, weke xweziyêke lezgîn û reha, cuda ji pêdiviyên mirov yên birastî.

Berhemxurî berê alaveke jiyana û xweşiyê bû, lê di civakên serdemî de ew bi xwe hêviyek e, ta asteveke ku mirov bi xwe û azadiya xwe bitenê dema ku berhemxuriyê dike hest dibe.

Ev azadiya sexte azadiya berhemxuriyê ye, ji ber prosêsa berhemxuriyê dibe prosêsa

bitenê bo hestbûna bi azadiyê li cem mirov, ew azad e ku çi hilbijêre ji kelûperan, azad e ku kîjan kelûperê baştirîn bibîne. Ev baştirîn li cem mirovê bêkarîn ji hêla mirovahiyê ve, wî diaferîne ku karî be bibe, bi hevalnava xwe weke kirînyar û berhemxur.

Ango mirovê serdemî bi xwe û hebûna xwe hest dibe dema berhemxuriyê dike, mirov xemgîn dibe û hebûna mirov dal dibe dema berhemxurî kêmtir dibe.

Berhemxurî, di hiş de bûye bi zorê, weke erk û rastiye, ta asteya ku mirovê serdemî bû gîrîstirîn û gewretirîn berhemxur di dîrokê de, ew kurê berhemxuriyê ye, durişmên nû weke (çi xweşik in tiştên nû.. Berhemxuriyê bike û em ê li cihê te biramin) pîroz dibîne.

Lê tîkelîya bitenê ku mirovê serdemî bi cîhana derve re girêdide ew tîkelî ye ku li ser arzî û berhemxuriyê ava dibe, bi vî awayî mirov dev ji azadiyê berdide û gumana azadiyê werdigire û guman dibe ku ew azad e, bi sedema ku ew dikare bijartinê bike di nav komek kelûpel û xizmetiyan de, yê ku civaka nûjen wan bo wî pêşkêş dike, weke xwe, weke koleyê ku xwediyê xwe bi azadî bibijêre.

Her wiha ev aliyê bazarî yê berhemxurî sîka xwe tavêje bi ser gellek tîgehên din de weke ziman û şahî û hezkirinê, ku tîkeliyên hezkirina mirovî dibin weke mînakîya ser bi serdanê, ji ber awayên hezkirinê yê naskirî weke hezkirina biratî, hezkirina dayikî, hezkirina zayendî, hezkirina xweyî û hezkirina Xwedê, li cihê wan awayên nû ji hezkirina sexte dideyinin, weke: Hezkirina mezin û hezkirina hestiyarî. Ta hezkirin bi xwe jî, di civaka serdemî de bû hezkirineke jihevketî, havî û berhemxurî... ■





GEŞTIYARIYA TÎRÊJ DI RÊVINGA SURIŞTÊ DE

Gulal kasaî

Surişt sedema efranderiya hemû aliyên hunerê ye, ji ber ku ew bixwe cihê himêza huneran e, D.Ebidil'zîz 'tîq dibêje :

“ Xwezaya jîndar ew e: merov, Cinawir û xwezaya bêdeng e ya dibe jîndar dema ku can xwe di wê de diweşîne ; bê guman yê ku can û bizavê pê têkil dike û bi şeweyekî bedew ji me re belo dike hostayê ristê ye. D.Ebdil 'zîz 'tîq dibêje:” Xwezaya bêdeng û hêmin ew e: Heşîn, koh, pesar û berpall in”. Ê ku van tiştan zindî dike û bi xwe re dike dost, geştgeh, tablo, û best e; helbestvan e; Helbestvan mîna her hostayekî hunerî ye, xwe bi xwezayê ve têkildar dike bi hiş, sewdan û derûna xwe ve.

Helbest navgîneke mirovahî ye, xwedanê wê hestedarekî pêjinker e, hilgirê jan, kul, evîn, û niyazên gelê xwe ye, mîna perekî ji ewrên tava biharî li deşt, zozan, devî, û delavên suriştê digere, ji van helbestvanên ku bi şeweyeke nazik, hûr, şayîk, û pesindar di dorhêla xwezaya welat de geştîyarî kiriye, Seydayê Nemir Tîrêj e.

Seydayê navdar Tîrêj bi palawanî destên xwe dirêjî raz û cankêşîya xwezayê kiriye, û bi sitîleke helbestî bedewîya xwezayê rêstîye:

Bihar e, hemî koh û deşt û zinar
Newal û nehêl çî sirt û pesar
Çî Kendal û berpall û kortal û dir
Zerîp û diyar û Çîmen hem jî gir.

Lê helbestvanê me yê zîrek xwezaya hêmen bi kevîra xwe li hev dixê da ku tabloyeke rengereng û ciwankariyeke seyr şanî me bike :
Weha reng e, panav û lat tev de hêşîn
Ji gul, çiçek û nêrgîz û yasemîn
Binefs û qawan û rehana dupel

Qedîf û sîmen, berberoj û nefel
Çivîk û quling, bilbil û endelîb
Di gel hev dinalin bi dengêd xerîb.

Bi Hostayî teşîya helbestê li çîya û deveran gerandiye; dema ku dibêje:

Derbend e hem Qelediz e Berzan digel
Rawandiz e

Şeqlaw e tev bax û rez e Têv şêher û bajarê
te bî

Homan û Rêzan û Bilî Mangêş û Zozan
û Gelî

Bolend û geliyê Beg Elî Armişt û Berwarê
te bî.

Bergeha helbestvanê me pirr fire ye, ji çiyakî diçe çiyakî din û di nava bajar û deveran de digere; digihe Amêdiyê, Zab, Dihok, Bamern, Kerkûk ta ku li ser sînorê Cemşîn û Gilal e, Dogan, û Sersingê.. bi ney û bilûra helbestê awazên Kewa Ribat dilîlîne.

Tîna dilê Seyda naşike her û her bi xema xwe ya kuldar dixwaze Rêvingî berya, hawing, û deştên çîyayan di sawîrên xwe de bilûsîne û bost bi bost bibîne û temînê bi hestedarî li nifşan dike:

Şengal û ser Medîyan e ew Eynzal û siwarê
te bî

Ranya û şehrê Xaneqîn berya li jêr çayê
Sefîn

Yek bostê em nadin ji wa Têv koh û zinarê
te bî.

Seyda di deryaya xuristê de bi melevanî evjeniyê dike, geh bi hime him di şepêlên Dujla, xabûr û Feratê de dişelpîne, û geh li kanî û cûbarên Mêrgê Sorê keriyên helbestê diçêrîne, dema ku ji wan tîn nagire xwe rastî Gol û bestên Şehre Zorê ber dide, daku avîna dilê Qulingê xwe bivejîne, û cardî li esîmanê welat bi aza bengîniyê şad bike, û her û her roja nû ji welatê rojê dûr nekeve;

Tu cejn û Newroz e yeqîn teyr û tilûrê
derzemîn

Wan hat bi mizgîna te jîn xweş tîn bi kewt
û xulxul e

Xweş tîn bi kewt û kom û tek Qaz û quling
û bazbelek

Şalûr û bilbil lek bi lek Berçemk û çûk
û qertel e.

Xweza li gel helbestên Seyda mîna pişkojên gulnaran li ser çuqliyên daran paldayî ne , li bendî sura bayê sibeyê ne, ku bi sanayî

pencerên xwe yên şadîmanî li ber pêlên stranên şalûl û bilbilan vekin, û henaseyeke aza ji bihna şemam û guleyan bikşîne da ku kelecana kerwanê omîdê di keldûmana surûşê de afsaneya çerxa bi dewran, fetil û ger be ;Bi vî awayî ta destên xwe dirêjî xwezaya Mîtafîzîkî jî dike û têkildariyeke cankêş di navbera surîştê jîwarî û xwezaya veşartî çêdike, ta dirinde, çol û bêlanan û Tebayên deşt û çiyayên welat li hawîr digel kerwan nobedar in :

Sê hawe tê deng, yek ji sira bayê siba ye

Hawayê dî ji dengê xuşîna dehl û reza ye

Hawê sisiyan ji bêhna(Bihna) şemamok û gula ye.

Kerwanê me va birêketî, lê şev û reş û tarî

Sermaya terez kuliyan di berfê her dibarî.

Qet çaraw umîda me nemaye bilbilê min

Meydane jib o hirç û çeql, gur zûr e zûr e

Meydan e ji bo hirç û çeql,rovî û keftar

Seyda destên xwe yên pîroz li defa gerdûnê dixê, Qewalib û sînorên xwezayê dişkîne û bi serbestî qoşa şeyê xwe yê resen digre û di gêra helbesta xwe de , bê zengo dide cirîdê .

Dinya bi xwe dewran e, bizan geh roj e, geh şev

Geh tarî û dûman e û geh rewşen û nûr e

Çerxa felekê herdem bi fetil û ger û dewran

Umîda me herdem bi xwe serdarê li berzan

Wek Tîrêj dibêje : Jîn dive kotek û zor e.

Geştgeriya helbestvan di nava xweza û pelateyek ji xaka welatê xwe de, û himêzkirina hemû pêkhatayên xuristê çî xwezaya hêmen û bédeng û çî ya bi awaz û lîlan dê mîna xeftan û pêşmalên rengerengî bi nêka teşîya xweşxwanan birêse û li tevna bedewiyê bixe .

Seydayê Tîrêj, zîrektirîn helbestvan e, hestiyar e, pêjinkerekî hunerbest e, di hûnandin, û çêjdariya bedwiya xwezayê de dilan dikelkilîne, helbestvanekî jîr e, nava cergan ji kûr ve dehejîne, bê qoş û zengo şeyê resen di nava xurista welat de, bi rehwan dibezîne. ■

1-D.Ebil'zîz Etîq-Wêjevan- (1906-1972).

2-Tîrêj-



وقد يكون العنف النفسي باهانة الضحية وابتزازها، وعبر التهديد والتخويف وتقييد الحرية وتوجيه الشتم وغالباً ما تكون الفئة المستهدفة بالعنف من هذا النوع من الأطفال.

-العنف الجنسي: وهو إجبار الضحية على ممارسة الجنس تحت التهديد سواء مع الشخص المتسبب بالعنف أو مع غيره، أي أن يدخل الضحية في دوامة العلاقات الجنسية غير المشروعة بالإجبار أو قد تكون بين الزوجين أنفسهما عن طريق الإجبار، ويضم العنف الجنسي كلاً من التحرش الجنسي أو الاغتصاب الزوجي وهو ممارسة الجنس مع الزوجة دون رضاها. أسباب العنف :

من أكثر مسببات العنف هي التربية والتنشئة الخاطئة للأهل والمعتقدات الاجتماعية المتوارثة، وهي تعد من أهم أسباب العنف الأسري فقد يكبر وينشأ الوالدان في بيئة غير جيدة الأمر الذي يجعلهما يتصرفان بعدوانية عند تكوين أسرة في المستقبل وبالتالي يكون تعاملهما مع أبنائهما مبنياً على الشدة والعنف.

غياب دور المجتمع فالمجتمع قادر على أن يغرس القيم النبيلة بين أفرادها، وذلك من خلال حملات الإرشاد والتوعية وتضمين المناهج الدراسية عن أسباب العنف ونتائجه وأضراره على المجتمع والمسبب.

العنف الناتج عن التطرف الديني وعدم فهم الدين بشكل صحيح، والانتماء السياسي التي تنتج عنها النزاعات والمشاكل والعنف، التأثير بالأصدقاء والجماعات الفاسدة، عدم اتباع أسلوب الحوار الأسري كأسلوب للتقريب بين وجهات نظر الأفراد من الأجيال المختلفة وبالتالي عدم إدراك الجيل القديم لاختلاف الجيل الجديد عنهم في كثير من الأمور، الأمر الذي يسبب حدوث التصادم والعنف بينهم لعدم التواصل إلى حل يرضي كل الأطراف.

الخلافات الأسرية بين الأزواج وما قد تسببه من مشاكل نفسية عظيمة في نفوس الأبناء فالابن عندما يرى والديه يتشاجران أمامه ولا يحترمان بعضهما البعض فإن ذلك يزرع العدوانية في نفسه اتجاه الآخرين.

أضراره


تهديد كيان المجتمع بأكمله وذلك لأن الأسرة هي النواة التي تشكل المجتمع وأي شيء يؤثر عليها وعلى كيانها يؤثر على المجتمع ككل، إصابة من يتعرض للعنف الأسري بالعقد والاضطرابات النفسية ومن الممكن أن تتطور لتصبح حالات مرضية أو تصرفات عدائية وإجرامية، وتفكك الروابط العائلية وفقدان الثقة وعدم الشعور بالأمان بالإضافة إلى إمكانية تلاشي الأسرة وفقدانها لمكانتها، ارتفاع فرص ممارسة الشخص الذي تعرض للعنف الأسري إلى نفس النهج في المستقبل مع أفراد أسرته.

الحد من العنف الأسري

خلق نوع من أنواع الرقابة لدى الأفراد فذلك يمنعهم من ارتكاب أي فعل خارج عن نطاق الأخلاق العامة وبالتالي يقلل من العنف الأسري مهما كانت صورته، الابتعاد قدر الامكان عن الأسباب التي تدفع الأفراد لممارسة العنف مثل عدم تدخل الأهل والأقارب في الشؤون الزوجية وتربية الأطفال والعدل بين الزوجات إذا كان هناك تعدد، نشر التوعية التي توضح أهمية التراحم والتراحم والأسري وتوضح أن المقصود بالقوامة ليس التسلط والاستبداد، توضيح الآثار المدمرة للعنف الأسري على الأسرة بشكل خاص والمجتمع بشكل عام وتقديم الاستشارات النفسية والاجتماعية للأفراد المعنفين، إنشاء المؤسسات التي تعني بشؤون الأسرة وذلك بوجود أخصائيين نفسيين واجتماعيين، تجنب مشاهدة لقطات العنف على شبكات الإنترنت والتلفاز، المساواة بين أفراد الأسرة. ■

العنف الأسري ..

من السبب إلى الحل



خالد المحمود

العنف :

يعتبر ممارسة العنف أحد أساليب سلب الإنسان حقوقه التي منحها إياها القانون والدستور، وهذه الظاهرة ليست حديثة الولادة بل أنها ظهرت منذ ظهور الحياة البشرية على سطح الكرة الأرضية، ويتم ممارسة العنف على عدة نطاقات متفاوتة و لكن العنف الأسري هو من أكثر أنواع العنف تأثيراً في المجتمع.

العنف الأسري :

يكتسب موضوع العنف الأسري أهمية لدى المؤسسات الحكومية على مستوى العالم نظراً لتأثر المجتمعات به، وقد عرفت البشرية العنف الأسري منذ قديم الزمان عندما قتل قابيل أخاه هابيل، ويشمل مفهوم العنف الأسري جميع أشكال الإساءة والاعتداء بين أفراد الأسرة الواحدة ويكون بطرق مختلفة ينتهجها الشخص المسيطر في الأسرة، و يمكن إطلاق مسميات أخرى عليه كالإساءة الأسرية والإساءة الزوجية، وتكون شرارة انطلاق العنف الأسري عادة خلافات زوجية بسيطة لتتطور فيما بعد وتصل إلى العنف، وتتفاوت حالات العنف الأسري ما بين بسيطة وخطيرة ويمكن أن يؤدي الحال بالعنف الأسري إلى أن يخضع الطرف المتضرر للعلاج الجسدي والنفسي.

أشكاله :

لا ينحصر العنف الأسري في مكان أو زمان معين فهو موجود في كل بقاع الأرض، ويمارسه أفراد منتظمون إلى كافة الأديان والأجناس والطبقات الاجتماعية والاقتصادية ويمكن تقسيمه إلى:

-العنف الجسدي: يوصف العنف بأنه عنف جسدي إذا دخل ضمن نطاق الضرب واللكم ومحاولة القتل أو الخنق أو الحرق أو الصفع، أي الأضرار التي تلحق الأذى بشكل مباشر بالجسد، وقد يتجسد أيضاً العنف الجسدي بعدم السماح للمتضرر بتلقي الرعاية الطبية إذا كان يتطلب الأمر ذلك، وقد تصل الأمور ببعض الأشخاص إلى إجبار الضحية على تناول المخدرات والكحول.

-العنف النفسي: يكون العنف نفسياً أو عاطفياً عند إذلال الضحية والاعتداء عليها لفظاً ويكون إما سراً أو علانية ويكون الشخص المتسبب بالعنف مسيطراً على الضحية عبر التحكم بتصرفاته وتحركاته وإجباره على القيام بأفعال لا يرغب فيها فيخضع الأخير خوفاً من العواقب،

الدولة الوليدة أسوة بغيرهم من الاثنيات المشكلة للنسيج السوري ممن يمتازون بحقوقهم الثقافية كي لا تندثر هويتهم القومية .

لا يخفى على احد الدور الذي لعبه المثقف الكردي في تكوين هذه الأحزاب وصياغة الفكر السياسي للمجتمع الكردي وحفاظه على الأدب الكردي من الاندثار والضياع في ظل ممارسات الأجهزة الأمنية القمعية المتتالية على حكم الدولة السورية ومحاولاتهم لمحو الهوية الثقافية والقومية للشعب الكردي، لكن مع تشققات وتصدعات الحركة السياسية الكردية وتناحرها لم نجد من المثقف الكردي ورجالات فكره موقف الاعتدال و الوسطي لينأى بنفسه عن التناحر السياسي، الذي انخرطت فيها الحركة السياسية بالمجمل، والتي لم توفق بدورها في إنشاء مرجعية يلوذ إليها المكون الكردي في سورية، بل سرعان ما وجدناهم هم أنفسهم أطرافا في الصراعات والتناحرات السياسية، ومشاركين فعليين في تلك المعركة ومساهمين في تأجيحها، وان كانت هناك أقلام خارج هذه والتناحرات، فقد كانت قليلة جدا لم ترتقي لان توصل كلمتها إلى الشعب، ولم تستطع التأثير فيه، أو أن تحافظ على القيم و الأخلاقيات المتوارثة لدى الشعب، بعيدا عن ميادين التناحرات السياسية و سجالاتها، ولا أن تشكل وعي اجتماعي لدى الأجيال الناشئة، ولا تصحيح مسار فكر الأجيال، وتفهمها بأن التطور والرقى ليس في الانحلال الأخلاقي و نبذ القيم الاجتماعية وان التحرر ليس التجرد من كل شيء والثورة ليست على المجتمع وإنما الثورة لأجل تقدم المجتمع، و تطهيره من المخلفات والرواسب .

قد يقول قائل: بأن الظروف السياسية وتسلبت الأجهزة الأمنية من جهة، وهيمنة الأحزاب السياسة من جهة أخرى، لم تترك للمثقف الكردي الفسحة والمتنفس للقيام بدوره.

سأخالفه الرأي ، لأن المثقف هو من ينير الطريق لغيره ولكي يكون الرائد في طرح أفكاره يجب عليه تحدي الوقائع واختلاق الظروف لطرح أفكاره، واخذ دوره في قيادة مجتمعه

إن المفكرين والمثقفين، في تاريخ المجتمعات البشرية عانوا الويلات ونكل بهم إلا أنهم لم يستسلموا وكانوا فعالين في مجتمعاتهم ومؤسسين لنهضتها الثقافية والعلمية . ان دور المثقف ليس مرهون بالزمان والمكان، حتى وان واجهته عقبات أشعرته بضمور دوره هذا لا يعني انتهاء دوره، بل واجب عليه مواصلة نضاله في ميادين الفكر والثقافة. ■

المثقف الكردي ودوره في الحركة الكردية

آراسي محمد



كلمة المثقف هي مفرد من كلمة المثقفين أصله المجرد (ثقف). اي الحاذق الماهر (مختار الصحاح)

و ثقف _ ثقفا : صار حاذقا فطنا (المعجم الوسيط)
والمثقف شخص حصل على قدر كبير من الثقافة والمعرفة في الفن و الأدب والسياسة ويعتبر المثقفين من نخبة المجتمعات وصفوتها

كما يجب أن يمتاز بالذكاء ليكون قادرا على استخدام فكره واستغلاله لتنمية المجتمع وحل مشاكله والنهوض به .

ومن الممكن تقسيم المثقفين إلى نوعين :

_ الموسوعي : وهو الملم بأكثر من مجال ثقافي .

_ تخصصي : وهو المختص في احد العلوم الإنسانية كالسياسة والاجتماع مثلا.

و أسوة بباقي المجتمعات البشرية فللمجتمع الكردي أيضا مثقفيه ورجالات الفكر الذين تركوا بصمتهم في الفكر و الأدب الكردي بشكل لا يمكن تناسيه أبدا، لكن نستطيع هنا تسليط الضوء على دور المثقف الكردي وتأثيره في الحراك الكردي إبان ثورة الكرامة السورية وما قبلها منذ استقلال الدولة السورية عن الانتداب الفرنسي، وتشكل الحكومات الوطنية، وظهور الأحزاب السياسية الكردية المطالبة بالحقوق المدنية الكردية، وتثبيت حقوقهم في الدستور السوري ليكون الكرد بذلك مواطنون ضمن

ŞÊWEKAR

BEDRAN BARÎ :

Hevpeyvîn: Imran Yûsiv

Di sala 1971ê de, li gundê Bor Se'îd yê navbera Heseke û Amûdê ji dayik bûye, zaroktiya xwe li gund derbaskir, piştî ku xwendina xwe ya seretayî li gund kuta kir, ya navendî û sanewî li bajarê Heseke gihande serî, û ji peymangeha amadekirina mamosteyan derçû, ji sala 1992an ve wek mamoste li dibistanên Heseke qonaxa seretayî kar kiriye, di sala 2013an de koçî Elemanya bûye û heya îroj li wir dijî.

-Şewekarê kurd Bedran Barî, çîroka we û hunerê çawa destpêkir ?

Hezkirina hunerê ji zaroktiya min ve destpêkir, piştî her baraneke buharê min ji wê herîya ku li beyarên gundê me dihate raxistin mirov, lawir û gellek tişt çêdikirin, her weha ji tîl û qutîyên vala min alavên cot û batoz çêdikirin, û min pir ji guhdarîkirina stranên folklorî hez dikir, û min tembûrek ji xwe re ji qutîka rûn û textikan çêkir.

Lê vê hezkirinê zû bi zû berhem neda, ew jî ji ber gellek sedeman bû, di serî de sedemên civakî û abûrî bûn, û ji ber ku ti guhdan bi hunerê li civaka me nebû.

Di temenê sîh saliya xwe de, min biryar da ku ez vê hezkirinê vejînim û heya ez li ser darê vê jînê sax bim divê ev hezkirin zindî bimîne. Wê gavê min berê xwe da navenda hunerê şewekariyê li Heseke, û weke endamekî min sê salan lê xwend, heya sala 2001ê, bi vî awayî ez baş li pêş ketim, ji wê demê ve ez karê şewekariyê dikim, her weha ez li bizqê jî didim.

Di sala 2008an de ez di Yekîtiya Şewekarên Sûrî de bûme endam .

-Di derbarê şîwazê ku hûn di hundirê tabloyên xwe de bi kar tînin de, gelo we ev şîwaz ji ku girtiye, an jî em dikarin bibêjin ku ev şîwazeke taybet bi Bedran Barî ye?

Ji destpêka hebûna hunerê ve heya îroj, ew di gellek qonaxan re derbas bûye, her qonaxek dibistanên xwe yê taybet hene, her dibistanek jî şeweyên xwe hene.

*"Hunermend
dikare bi rêya
hunera xwe dostan
ji bo doza gelê xwe
çê bike"*



Ji dibistana klasîk û jîwerî bigir heya tu bighêjî dibistanên suryalî, enalîzm, nûjen û pişt nûjen...hwd.

Bi dîtina min, divê şewekar di qonaxa jîweriyê re derbas bibe û ji wê dest pê bike, piştî ku baş têde bigihêje û ji alav û imkanên xwe yê nîgarkêşiyê piştraşt bibe ew dikare şîwazekî taybet ji bo xwe biafirîne ku ew şîwaz guncawî raman û mijarên wî be.

Hîn ez ne dîrî dibistana jîweriyê me, di piraniya karên xwe de cîweriyê tevî derberîna dikim, li gel hinek ji analîzmê.

-Hin rexnevan dibêjin : "Huner tenê ji bo hunerê ye" ango mebesta hunerê tenê bedewî ye, hin din jî dibêjin "Huner ji bo guhertina civakê ye", ango divê ku her tabloyek nameyekê di hundirê xwe de hilgire. Hûn çî armancê datînin ber çavên xwe dema ku dest bi tabloyekê dikin ?

Çendî ku hunermend û şewekar bi nîgaş, hizir û ramanên xwe dîr biçe, dawîyê ew dimîne mirov û endamê civakê, bi wê civakê bandor dibe hem jî bandorê lê dike.

Dema ku ez dest bi tabloyekê dikim, hizir û ramanên min ber bi cîweriyeke dîr yan nêzîk ve diçin, wê gavê hewil didim bi xêz û rengan bûyereke ku bi rastî bûye derberînim, û heman bûyerê bînim bîra yê bîner û bihêlim ku têde bihizire, di heman demê de jî karvedaneke derûnî û ramiyarî pêre çê bikim. An jî ,û ji ber ku niha ez li Elemanyayê me, dixwazim wan bûyerên ku li welatê min

rûdidin, êş û azarîyên gelê xwe bi rêya tablo û rengan bighînim bînerê Elemanî.

Gotinek nemir Yılmaz Gonê heye dibêje :
“Armanca min li jiyânê ne karê hunerê bû, lêbelê rizgarkirina gelê min bi rêya hunerê bû.”

Bi dîtina min divê huner têkeve xizmeta civakê û ji bo wê be, wek armanc ji bo hunehrê ev di pila yekê de ye.

Lê dûrbûnek dikeve navbera hunermend û bîner dema ku karîna bîner ji bo têgihiştin û xwendina tabloyê kêr û lawaz be, û asta çanda wî ya hunerî nizim be, di heman demê de yê şewekar xwedî ezmûneke dûr û dirêj be û şîwazê wî yê hunerî nêzî analîzmê be. Lê ev nayê wê wateyê ku şewekar dûrî jîweriya xwe ye, an xizmeta civaka xwe nake, lê dibe ku cewawerekî wî hebe karê wî dişopîne û hewil dide ku tabloyên wî baş bixwîne.

Huner roleke pir mezin di pêşketina civakê de dilîze, pirsgirêk û aloziyên civakê bi şîwazekî şarîstanî, payebilind û bedew diyar dike, hew weha gellek pirsan li bal yê bîner diafirîne û wî rûbirû li hemberî wan pirsgirêk û arîşîyan datîne, û wî beşdarî dîtina çareyên guncaw dike.

Ji alîyekî din ve, huner dîroka civakê belge dike. Her karekî hunerî vedigere demekê, cihekî û qonaxê dîrokî, mirov dikare dîroka gelekî an civakêkê bi rêya huner, folklore û çanda wî gelî an wê civakê nas bike.

Huner nerîn, çêj û çanda hunerî ya gelan li pêş dixe, her weha pêwendî û tîkeliyan di navbera gelan de ava dike û wan bi çandên hev û dû dide nasîn, lewra hunermend dikare bi rêya hunera xwe dostan ji bo doza gelê xwe çê bike.

-Hûn rola hunermendên kurd, bi taybetî a şewekarên kurd divê qonaxê de çawa dinirxînin ?

Huner nameyeke pîroz e, dikare civaka mirov li pêş bixe, îro gelê me di qonaxê zehmet re derbas dibe, heya ji me bê emê hewil bidin ku dengê wî bighînin cîhanê, û bi rêya hunera xwe ji gelên cîhanê re bibêjin ku em dikarin şer bikin, nîgarkêşiyê bikin û hez bikin.

-ji bo siberojê, çi projeyên we hene ?

Di vê mehê de pêşangeheke min li bajarê Nînborg yê Elemanî heye, ji bo sala nû jî karê xwe û çend pêşangehan dikim.

-Gotina we ya dawîyê ?

Di dûmahîkê de, ez spasiya kovara we û hemû karmendên wê dikim, serkeftinê ji karê we re dixwazim.

Kar û pêşangehên şewekar :

-Pêşangeheke hevbeş li gel xwendekarên navenda hunerê şewekariyê li Heskê sala 2000an.

-Pêşangeheke tekane li navenda çandê li bajarê Heskê sala 2003an.

-Pêşangeheke din li Heskê sala 2008an.

-4 Pêşangeh li Elemanyayê.

-Li gel çend şewekarên kurd beşdarî di çend pêşangehên hevbeş de li bajarên Elemanya kiriye.

-Beşdarî di pêşangeheke hevbeş de ku ji bo bîranîna a komkujiya Şengalê ya 2014an li Siwêdê kiriye.

-Beşdarî pêşangeha Amedê ya 2015an bûye.

-Beşdarî çalakîyên piştigiriya Efrînê li bajarê Bon yê Elemanî bûye. ■

Wergerandin ji zimanê erebî : Imran Yûsiv



QEDRÎ CAN..

JİYAN û BERHEM

Ronakbîr, helbestvan û nivîskarê kurd Qedrî Can di sala 1911an de li bakurê Kurdistanê, li Dêrika Çiyayê Mazî ji dayik bûye. Navê wî yê rast Ebdîqadir Ezîz Can e, lê di nasnameya wî ya xwendinê de (Qedrî Ezîz Can) hatiye nivîsîn.

Di destpêka xortaniya xwe de, Qedrî Can tevî tevgera xebat û tekoşîna gelê xwe dibe, lê ji ber zulm û sitemkariya dewleta Turkiyê ya li ser gelê kurd ku hemû çalakvan û xebatkarên kurd digirtin û dixistin binê zindanan, Qedrî Can di sala 1931 de dakete bin xetê. Seydayê Cegerxwîn di bîranînên xwe de dibêje :(..Du xortên ciwan ji kurdistanê turkiyê hatine Amûdê, xwendina xwe ya lîse xelaskiribûn, herdu xort Qedrî Can û Reşîdê Kurd bûn). Dr.Xalid Qotreş jî dibêje : (Qedrî Can, ji ber sitema tirkî xwendina xwe nebîr serî, di sala didiwan ji xwendina li (mala mamosteyan) de reviya û daket Sûriyê.) Lê hin dibêjin ku ew di sala xwe ya çaran de bû ji xwendinê dema ku daket. Di berdewamiya gotina xwe de Dr.Qotreş dibêje : (Temenê wî 17 sal bû dema ku daket Sûriyê. Di salekê de fêrî zimanê erebî bûye, li bajarê Selemyê mamostetiya çandiniyê dixwîne, piştî ku xwendina xwe dighîne serî, li bajarê Entakyê dibe mamoste.

Qedrî Can li bajarên Qamişlo û Amûdê, her weha li Şamê, taxa kurdan û derdora wê jî mamostetî kiriye, di pişt re demekê li wezareta perwerdeyê wekî rêvebirê kar xebitiye, li dû wê li rêveberiya tomara giştî ya karmendên dewletê kar kiriye.

Demek têre naçe tevî komkarên azadîxwazan dibe û mîna kesekî ronakbîr û rewşenbîr tê naskirin.

Qedrî Can di hejmara pêşî ji kovara HAWARê de nivîsiye, xebata wî ya di warê wêjeyê de ne kêmkî xebata wî ya welatparêzî bûye.



Derbarê karê Qedrî Can yê siyasî de, sê nerîn derketin holê, yek dibêje ku di sala 1944an de piştî ku felsefa marksî û ramanên Lînin naskiriye ew bûye endamê partiya komonîst ya Sûrî, nerîna din dibêje ku ew nebûye endamê partiya komonîst, lê ew endamê partiya dîmoqrata kurd li Sûriyê bûye, nerîna sêyem jî herdu nerînen bûrî red dike û dibêje ku Qedrî Can xebatkar û welatparêzekê pêşketî bû û endamê komela xweybûnê bûye.

Di tîrmeha sala 1957an de bi grûpek xortên kurd re beşdarî mehrecana ciwanên cîhanê yê şeşan li Moskoyê dibe, û li wir serdana serdarê şoreşa kurdî Barzanîyê nemir dike û helbesta xwe ya bi navê (serdarê kurdan Berzanî) diyarî wî dike.

Li Moskoyê, Qedrî Can rewşenbîrê kurd Prof.Qenatê Kurdo dibîne, û çend helbestên xwe yên ne belavkirî bi xêza destê xwe diyarî wî dike, navnîşanên wan helbestan jî evin : (Ez diçim Mosko – Begê axir zeman – Reya taze – Gula sor)

Ji ber xebata wî ya ramyarî û toreya, ji hêla desthilatdariya Sûriyê ve çend caran hatiye girtin û

du salan(1959-1961) li zindana Mezê girtî maye.

Qedrî Can piraniya berhem û nivîsên xwe di kovar û rojnameyên ku li Sûrî û Libnanê derdiketin wek (Hawar, Ronahî û Roja Nû) de belavdikir. Çend helbest li Îraqê, di kovara Hêwa, Gelawêj û rojnameya Azadî de jî belavkiriye.

Ji bilî çîrok û helbestan, çend gotarên wî di kovarên Hawar, Ronahî û Roja Nû de jî belvbûne, jî wan : Silêman Bedirxan- Gelo ne wisa ne-Bihara Dêrikê- Yaney Serkewtin.

Li kêleka helbest, çîrok û gotarê, Qedrî Can karê wegerandinê jî kiriye, û ew di wergerandina romana (Şivanê Kurd) ya Erebê Şemo de alîkar bûye, herweha pêşgotina dîwana yekem ya Seydayê Cegerxwîn nivîsiye.

Di sala 1939an de jin aniye, du kur û keçek wî jî xanima wî (Neylûfir) hene, navên zarokên wî jî evin : (Mizgîn-Şêrîn-Serwer)

Di tebaxa sala 1972an de koça dawîn kiriye, û li şarê Şamê, li taxa Kurdan, li goristana Şêx Xalidê Neqşebendî termê wî yê pak spartî axê bûye.

Berhemên Qedrî Can :

-Helbest

Li gorî rexnevan û şopînerên helbesta kurdî, Qedrî Can bi helbestên xwe helbesta kurdî ber bi qonaxê nû ve ajotiye, Nivîskar Dîlawerê Zengî di pirtûka xwe ya bi navê (Qedrî Can) de derbarê helbestên wî de wiha dibêje :

(Qedrî can sazkarê dibistana jîwerî ya nûjen di toreya mîletê Kurd de bû. Ala helbesta nuhbûn û nûjeniyê li cîhana toreyîyê hildabû jor.Toreya mîletê Kurdî bi kok û rehên wê yên resen ve girêdida û ji êmîş û kaniyên welatê xwe vedixwar. Te digot qey dixwaze ji cîhanê re bibêje: Em in xwedanê şaristaniya kevin di cîhanê de, xwedî rewşenbîriyeke serbixwe ne.Em neviyê Cizîrî ne, li hemberî dirêjahiya bejna demê ne, me rehên xwe bera xaka dîrokê dane.Em dikarin bi pêvajoya demê re afrandinên nû û pêşveçûyî di meydana tore û rewşenbîriyê de biafirînin)

Her wisa Rojê Lîsko jî dibêje: «Em dikarin helbestvan Qedrî can sazkarê helbesta Kurdî ya nûjen bibînin, digel Şêx Nûrî û pîremerd û Goran»

-Çîrok

Di heman pirtûka Dilawerê Zengî de, di derbarê

çîrokên Qedrî Can de wiha hatiye :

“Naveroka çîrokên Qedrî can di cîhana bîranînan û demên bûrî de digere, mîna:bîranînên zarotiyê, birayên xwînê,xewn û sawêr,û berhaweyên Kurdî. Pir dûrî ramyariya rojane ya gerim diçe.Lê bîna niştimanperweriyê ji hemiyarên tê. Naverokên çîrokên wî tersî naverokên helbestên wî ne. Pireya mijarên helbestên wî bi ramyariya rojane ve tene girêdan.”

-Wergerandin:

Xebata Qedrî Can di warê wergerê de ne kêmtir xebata wî ya di warê helbest û çîrokê de ye. Guhdana wî bi wergerê nîşana bîrweriyeke bilind e, çiku pêdiviya toreyî kurdî bi wergerê heye da ku bikaribe li pêş bikeve.

Hin wergerên Qedrî Can :

Çîroka nivîskarê Misrî (menfelûtî) ya bi navê(Tayek porê sipî) wergerandiye zimanê Kurdî.

Pertûka rêbarê Rûs Grigorî Pêtrof (Di welatê zembeqê gewir de), li ser daxwaza Dr.Ehmed Nafiz werdigerîne zimanê Kurdî,û di rojnameya Roja Nû de,mîna gotaran, perçe perçe, dide belavkirin

Jêder

Qedrî Can 1911-1971...Dilawerê Zengî

- إيف تيرو :

- إيف تيرو :

قبل مئات، بل آلاف السنين لم يسكن غابتي سوى الحيوانات. لم يكن الإنسان قد جاء إليها بعد. ولم تكن أوراق الأشجار تردّد أصداً أصوات الإنسان، وإن كان للحيوانات أعداؤها، فما من عدو فيها كان ذا قدمين كهذا، غير المتوقع والمنافق والمخترع الذي أتى فيما بعد. كان الإنسان عدو الحيوانات كافة، مشبعاً بالغدر. يقتل الأيل ثم يمزقه إرباً إرباً وينثر لحمه في كل مكان على شاطئ البحيرة.

بعد مضي مئات السنين، لا بل آلاف السنين، جاء بشر آخرون من ذوي البشرة البيضاء، جاؤوا إلينا بما هو مروع. لم ينصبوا شراكاً لينة، إنما فخاخاً معدنية رهيبة تمزق اللحم شر تمزيق.

-محمود درويش :

هنا انتحر الصقر غماً، هنا انتصر الغرباء علينا،
ولم يبق شيء لنا في الزمان الجديد
هنا تتبخر أجسادنا، غيمة غيمة، في الفضاء
هنا تتلاّأ أرواحنا، نجمة نجمة، في فضاء النشيد.

إيف تيرو :

هنا، على مرأى من الجميع، معرضاً لهبات الريح
الباردة، وفي ضوء صباح الشتاء الشاحب، سأنجز مصري،
مؤمناً لقومي مصره.
لم يسمعوا صوتي، صوت امرئ يصرخ في صحرائه وحيداً.
هل سيكون لاسمي رنةً عدوية وإباء لديهم؟
علقت في أعلى العمود الخشي الأبيض رباط عدتي
التي كنت أعلقها في كتفي، تلك التي صنعتها بنفسني
معلقاً على هذا النحو، لا تكاد قدماي تلمسان الأرض،
كنت أتأرجح مع ربح الصباح
بعد ذلك قطعت، بمدينة شريان زندي الأيمن، ثم بسرعة شريان الزند الأيسر
فسالت الحياة من جسدي سيلاً سريعاً، في الصباح الباهت.

إنني أتذكر زمن اللحاء
كان ذلك في زمن لم تردّد الأصداً فيه سوى لغتنا. زمن
الخطوات الحاسمة، حيث كان الرجال يفكرون حول النار.
زمن كانت للنسوة فيه حركات بطيئة، وكان انحناء أذرعهن
منسجماً مع انحناء أشجار الصفصاف الكبيرة المائلة.
لم تكن هناك رائحة المازوت على الدروب.
والصوت الوحيد في السماء، كان قصف الرعد المدوي في
الأفق أثناء أمسيات الصيف الحارة
حينذاك، كان اللحاء بالنسبة إلينا كالدم في العروق، وكجلد
الأيل فوق أكتافنا..

كنا نطبخ ونجري ونتسلق ونشرب بفضل اللحاء .
يجب على فتيات قبيلة المونتانيه، أن يتقن الغناء من فوق القمم،
وأن تسيل أصواتهن على بشرتنا كدغدغة منعشة .
فليعرف الرجال كيف يحبون ولتزدد النساء حباً. وليتذكروا زمن
اللحاء، وليلقنوا الفتيات درساً بأنه لا يوجد لحن أسمى من لحن
الحب ولا صوت أعمق من صوت الحب.
وليلقنوا رجالنا عدوية الدمومة المنجزة بأمان في بلد السرمدية...
-محمود درويش:

وكنا هنا...
نعمّر أكثر، لولا بنا دقّ إنجلترا والنبيذ الفرنسي والأنفلونزا، وكنا
نعيش كما ينبغي أن نعيش برؤفة شعب الغزال
ونحفظ تاريخنا الشفهي، وكنا نبشركم بالبراءة والأقحوان..
لكم رؤيتكم ولنا رؤيتنا، ولكم أمسكم ولنا أمسنا، والزمان
هو النهر حين تُحدّق في النهر يغور في الوقت فينا...
ألا تحفظون قليلاً من الشعر كي تُوقفوا المذبح؟
ألم تولدوا من نساء؟ ألم ترّضعوا مثلنا
حليب الحنين إلى أمهات؟ ألم ترّددوا مثلنا أجنحة؟

درويش و تيريو... خطبة الهندي الأحمر و أشيني

محمد صيدو تجاري

- إيف تيريو:

رجعت في الصباح إلى المحمية، عبرت الطريق المعبدة حيث كانت
شاحنات ضخمة تنقل الصخور. أي تمزيق آخر ابتكره البيض
لترتي؟
لقد شيّدوا مدينة "سيت إيل" و أقسروا الهنود من هذا الخليج
الهاديء على الرحيل...
وحيث لم يوجد سابقاً سوى هضبة صخرية، قبل إنهم سوف يبنون
ميناء اسمه "ميناء كارتيه".
(أليس هذا هو اسم أول رجل أبيض جاء إلى هنا وتملّق أجدادي
ووعدهم بإله وملك؟).
في كل مكان، على طول الساحل الشمالي، فجّر البيض الآن
الجرانيت، وقطعوا الغابات وشوهوا الجبال. أي شيء لم يفعلوه
من أجل الوصول إلى خامات الحديد والنحاس، ومن أجل ركوب
الأنهار، وإيصال الكهرباء إلى الوحوش المتشددين في الأراضي
الجنوبية؟

- محمود درويش:

سنسمع أصوات أسلافنا في الرياح، ونضغي إلى تبضهم في براعم
أشجارنا.
هذه الأرض جد مقدسة كُلهّا، حجراً حجراً
، هذه الأرض كوخ لآلهة سكنت مَعنا، نجمة نجمة، وأضاءت لنا
ليالي الصّلاة...

مشينا حفاةً لنلمس روح الحصى
وسيرنا غرة لثلبسنا الرّوح، روح الهواء ، رويداً رويداً.
ونحفظ ذكرى أحببتنا في الجرار مع الملح والزيت،
كنّا نعلق أسماءهم بطيور الجداول
وكنا الأوائل، لا سقف بين السماء وزُرقة أبواننا
ولا خيل تأكل أعشاب غزلاننا في الحقول ولا غرباء
يمرون في ليل زوجاتنا، فاتركوا الناي للريح تبكي
على شعب هذا المكان الجريح... وتبكي عليكم غداً،
وتبكي عليكم... غداً .

وقت بين يدي قصيدة محمود درويش «خطبة الهندي الأحمر - ما قبل
الأخيرة- أمام الرجل الأبيض» فوجدتُ فيها لوحات وصوراً
كثيرة شبيهة بصور ولوحات رواية الكاتب الكندي إيف تيريو «أشيني»، التي
كنتُ ترجمتها ونشرتها دار الحصاد في دمشق.
ثمة في العملين تعاطف إنساني دافئ مع الهنود الأحمر، و استنكار عميق لما
اقترفته بندقية الرجل الأبيض، وسلاحه الفتاك بالسكان المحليين وطبيعتهم!
بعثتُ عن طريق أحد الأصدقاء في الشام نسخة من «أشيني» بالعربية، إلى
الشاعر محمود درويش، ولكنه رحل قبل استلامها، يا للأسف !
أنشر بعض الصور المتشابهة في العملين المذكورين:

- محمود درويش:

يقول الغريب كلاماً غريباً، ويحفر في الأرض بئراً
ليدفن فيها السماء. يقول الغريب كلاماً غريباً.
ويصطاد أطفالنا والقراش.
بما وعدتْ حديقتنا يا غريب؟
بورء من الزّينك أجمل من ورودنا ؟ فليكن ما تشاء
ولكن، أتعلم أن الغزالة لا تأكل العُشب إن مسّه دُمنا؟
أتعلم أن الجواميس إخوتنا والنباتات يا غريب؟
فلا تحفر الأرض أكثر!
لا تجرح السلحفاة التي تنام على ظهرها الأرض،
جَدُّنا الأرض، أشجارنا شعرها
وزينتنا زَهْرُها.

"هذه الأرض لا موت فيها"، فلا تغيّر هشاشة تكوينها !
لا تُكسّر مرايا بساينتها
ولا تحفل الأرض، لا توجع الأرض.
أنهارنا خصرها وأحفادها نحن، أنتم ونحن، فلا تقتلوها...
سنذهب، عما قليل، خذوا دَمنا واتركوها كما هي، أجمل ما كتَبَ الله فوق
المياه،
لَهُ... ولنا.



DEMSALA ZIVISTANÊ Û KÊMPEYDABÛNA DERFETÊN KAR

Efsan Kurdî

Her sal, bi hatina werzê zivistanê re kar li her deverê kême dibe, û derfetên bidestxistina kar jî zehmet dibin. Li Rojavayê Kurdistanê û deverên rêveberiya xweser, di werzê havînê de kar pir dibe û bi hêsanî tê dest xistin, bi taybetî ew karên ku girêdayî avahiyê ne, lê bi hatina werzê sermê re gellek kar tene rawestîn, çiku keş û seqa alîkariya berdewamiya van karan di werzê sermayê de nake. Wekî mînak rawestîna tevgera avahiyê dibe sedemê betlaneya gellek karkeran.

Di heman demê de jî, debara jiyanê di werzê zivistanê de zehmet dibe, çiku buhaya gellek tişt û pêdiviyên jiyanê rojane yên welatiyan bilind dibe, û mesrefa malê giran dibe. Ev yek dibe bargiraniyeke zêde li ser milê wan karkerên ku bê kar dimînin.

Pend û metelok dibêje “qirûşê xwe yê sipî ji bo roja xwe ya reş veşêre”.

Hin karker jî havînê ve karê xwe û werzê zivistanê dikin û pereyên xwe hiltînin da ku têra mesrefa wan û zivistanê bike, lê ne her karker dikare vê yekê bike çiku gellek ji wan bi nan û zikê kar dikin û kiriya wan bi zor têra debara jiyanê wan dike.

Derbarê vê mijarê de hoste Selam Ehmed ku ew xwediyê kargeheke bilokan e, ji kovara welat re axivî û got :


“Ji serê havînê de karê me gellekî baş bû, em rojekê jî ranewestiyane, 6 karker li cem min kardikin, rojane xerciyê baş ji min û wan re dimîne, jixwe wek hûn dizanin, havînê mesrefa ku li xwarinê

diçe jî kême e, ji ber şînatî pir e û erzan e, ne wek çile ye, lê zivistanê karê me kême dibe, carnan jî bi carekê re radiweste. Ji ber vê yekê divê ku em her sal hesabê xwe û zivistanê bikin, xerciyêke taybet deynin alîkî, ku eger kar rawestiya em karibin di wan çend mehên çile de debara jiyanê xwe pê bikin.

Lê ne her dem hesabê malê û sûkê li hev derdikeve.

Îsa xelef karkerek e, li ber destê hostakî lêkirinê bi kiriya roja xwe kar dike ji kovra welat re got:

“Ez li ber destê hostakî kar dikim, roja min incex têra debara jiyanê min a rojane dike, ango karê bi nan û zikê ye, ez nikarim bi vê kiryê ti pereyan bidim ser hev, eger kar bi hatina zivistanê re radiweste rewşa min û ên wek min perîşan bibe, eger rojekê tenê bê kar dimînim ez wê rojê li kepa nanê xwe diheyirim, vêca çawa ezê pereyan ji bo zivistanê bidim ser hev !?” ■



المفرقات لعبة الأطفال المفضلة في الحسكة

تقرير: مجلة ولات

و للتعرف على سر المتعة التي يشعر بها الطفل مع لعبة المفرقات سألنا الطفل يوسف ١٢ عاما عما إذا كان يحب اللعب بالمفرقات أم لا أجاب بعد لحظة من التردد بأنه يحب اللعب بالمفرقات وعندما سألناه عن سبب حبه لها قال بأنها لعبة ممتعة و إن الصوت الذي تصدره عند انفجارها مثير و ممتع ثم بدأ بتعداد أنواع المفرقات مضيفا بأن بعض الأنواع منها تصدر ألوانا مضيئة و هذا أيضا يشعره بالبهجة و السرور و أضاف الطفل يوسف بأنه يفضل المفرقات التي تصدر أصوانا أقوى من غيرها من الأنواع. و عند سؤاله عن النقود التي يشتري بها المفرقات قال بأنه يخصص نصف مصروفه اليومي لشرائها.

و عن هذه الظاهرة سألنا الدكتور محمد خير نجاري و هو يعمل في إحدى منظمات المجتمع المدني في الحسكة حيث قال لمجلتنا بأنه يجب ضبط هذه الظاهرة عبر منع الانتشار العشوائي لأكشاك بيع المفرقات و يجب ان يرتبط توفرها و استخدامها حصرا بالمناسبات العامة كاحتفالات رأس السنة و هو ضد أن تتوفر طوال أيام السنة خاصة في متناول يد الأطفال حيث يجب منع بيعها للأطفال لأنها قد تسبب الأذى لهم.

ان الاستعمال غير الحضاري للمفرقات و الألعاب النارية يعتبر ظاهرة اجتماعية خطيرة و سنويا هناك عشرات الإصابات الناجمة عن الاستخدام الخاطئ لها لذلك يجب الوقوف بجدية على اخطار هذه الظاهرة و وضعها في سياق منضبط. ■

تعد ظاهرة انتشار المفرقات في مدينة الحسكة مرتبطة بالمناسبات و الأعياد فقط بل تكاد ان تتحول إلى ظاهرة اعتيادية سائدة . فالمفرقات و الألعاب النارية بمختلف أنواعها باتت متوفرة و في متناول الأيدي على مدار أيام السنة حتى أصبح استخدامها و اللعب بها خاصة عند الأطفال شبه عادة يومية و اللعبة المفضلة لديهم.

على أرصفة شوارع الحسكة تنتشر أكشاك بيع المفرقات بأنواعها المختلفة حيث يقبل الأطفال على شرائها بكثافة , كما أن ظاهرة اللعب بالمفرقات لدى الاطفال باتت قملأ أحياء و شوارع و أزقة المدينة.

حول هذه الظاهرة أعدت مجلة ولات هذا التقرير حيث التقت بالعديد من المواطنين و استقصت آراءهم حول هذا الموضوع

السيد أحمد حاج محمد و هو من سكان الحسكة قال بأنها ظاهرة انتشار المفرقات و الألعاب النارية هي ظاهرة سلبية جملة و تفصيلا و أضاف لم نعد نميز بين أصوات المفرقات و أصوات الرصاص الحقيقي مما يخلق حالة من الفزع و القلق خاصة لدى النساء , كما أن وجود المفرقات في متناول الأطفال هي ظاهرة غير صحية و قد تتسبب بالأذى لهم , لذلك نناشد الجهات المسؤولة بضبط هذه الظاهرة و منع بيع المفرقات للأطفال.

و عند سؤالنا السيد حاج محمد عن ما إذا كان أطفاله يلعبون بالمفرقات أم لا ؟ قال بأنهم كانوا يرغبون بذلك و يطالبون بالحصول عليها و لكنه لم يسمح لهم بشراء المفرقات و اللعب بها خوفا من أن يؤذوا أنفسهم.

لكن السيد صلاح حسين كان له رأي آخر حيث أبدى ارتياحه من توفر المفرقات و السماح ببيعها بعد أن كان الحصول عليها صعبا بسبب عدم توفرها حيث قال بأن المفرقات و الألعاب النارية هي من أهم طقوس الاحتفال بالمناسبات الخاصة و العامة و بغيابها تفقد المناسبة رونقها و أضاف في السنوات الماضية و عندما كانت المفرقات مفقودة كنا نبحث عن بديل لها للاحتفال بمناسباتنا و لكن كل البدائل لا تعوض البهجة التي تضيفها تلك المفرقات و الألعاب النارية على طقوس الاحتفال, أما الآن فان تجارة المفرقات أصبحت مرخصة و أصبح التجار يجلبونها من إقليم كردستان مما أدى إلى توفر عشرات الأنواع منها كما ساعد على رخص ثمنها.

و حول خطورة استخدام المفرقات على الأطفال قال صلاح بأنه يقوم بنفسه بشراء المفرقات لأطفاله و يشاركهم في استخدامها و اللعب بها فالأطفال يستمتعون كثيرا بذلك و لا يجب أن نحرم أطفالنا من هذه المتعة خاصة و إنهم يشاهدون أقرانهم يلعبون بها. ثم قال بأنه قد خصص مبلغا من المال لشراء المفرقات و الألعاب النارية لاحتفالات رأس السنة.





SÊ HELBESTÊN TOMAS TRANSTRÖMER

Werger, Şêrgo Dakorî

Nîsan û bêdengî

Buhar xopan e li vê derê.
Cihoka mixmelî ya tarî
li kêleka min disûrike
bêyî ku ti wênayan vebeyîne.

Tenê gulên zer
ronahiyê didin.

Ez di siya xwe de tîm rahiştin
wek kemanekê
di sindoqa xwe ya reş de.

Tiştê tenê yê ku ez dixwazim bibêjim
dûrî destê min diçirise
wek zîvê
li cem selefkarêkî.

* * *

Şeveke zivistanî

Bahoz devê xwe dixê xanî
û pif dike da ku awazan jê derîne.
Ez bi dilegiranî radikevim, xwe
diqulêpim, û çavgirtî
nivîsa bahozê dixwînim.

Lê çavên zarokê di tariyê de mezin in
û bahoz ji zarokê re gazinan dike.
Herdu ji lempayên ku hêlan dibin hez
dikin.
Herdu li nîvê rê ne ber bi zimên ve.

Bahoz xwedî dest û baskine mendalî ye.
Karwan bi aliyê Lapplandê ve direve.
Û xanî bi komstêrên xwe yê ji bizmarên
ku dîwaran hev girtî dihêlin, di hise.

Şev bêliv e li ser erda hindirê me
(li wir hemû gavên ku dengê wan dimire xwe vedihêsin,
wek pelên binavbûyî di golekê de)
lê li derve şev har e!

Di ser dinyê re bahozeke girîngtir derbas dibe.
Ew devê xwe dixê canên me
û pif dike ji bo awazan derîne. Em ditirsîn
ku bahoz bi pifkirina xwe me vala bike.

* * *

Madrîgalek

Min daristaneke tarî wîraset kir ku ez kêr diçim wê. Lê
wê rojek bê
ku mirî û jîndar tê de cihên xwe bi hev biguhêrin. Wê demê
wê daristan
dest bi tevgerê bike. Em ne bêtêvî ne. Tawanên herî aloz
bê şirove dimînin tevî beşdariya gelek polîsan. Bi eynî şêwe
li cihekî di jiyana me de evîneke mezin ya bê şirove heye.
Min daristaneke tarî wîraset kir lê ez îro derim daristaneke
din, ya bi ronî.
Her tiştê jîndar distirê, xwe ditewîne, diheje, û disûrike.
Buhar e
û bayekî pir xurt tê. Fêrnameyeke min ji zanîngeha
jibîrkirinê heye û ez destvala me wek kirasê li ser benê
cilan.

Tomas Tranströmer (1931 – 2015) helbestvanekî swêdî ye. Helbesên wî medîtatîv in û girêdayî xwezayê ne. Di sala 2011 de xelata Nobel a wêjeyê wergirt. ■

نحن طلاب الحرية

شعر: جكر خوين

ترجمها شعراً: منير محمد خلف

عربٌ وكرْدٌ إخوةٌ
هم إخوةٌ
شعبٌ يناضل ثم يكدحُ
ثم يكدح كي يموتُ
من أجل أغلى قوتُ
قوتِ الشعوب وحلمها الأبدِي
ياقوتاً على سور المعابر والحدودُ
حلم الشعوب
بأن تعيش بلا قيود .

الشعبُ عمالٌ وفلاحونُ
أعداء مدّ الظلم والطغيانُ ،
إنّا نسلح أنفساً جبارةً للحرب
ضدّ الظلم
ضدّ الطامعين مدى الدهور .

إنّا نحارب باطلاً
مثل الأسود وكالنمور
إنّا سنبنّي بالسلام بلادنا
وبكل أنواع الكلام،
نهدّ فوق رؤوس أعداء الحياة رؤوسهم
ونسير نحو بلادنا
ونسير نحو بلادنا

جكر خوين: من أبرز شعراء الكرد، يعدّ مدرسة في الشعر الكردي .

اسمه: ملا شيخموس حسن محمود علي ،
ولد في قرية هساري في كردستان تركيا ١٩٠٣
ومات في السويد ٢٢ / ١٠ / ١٩٨٤ ودفن في بيته
بمدينة القامشلي ، والقصيدة من ديوان: (كيم
أز) الصادرة عام ١٩٧٣

العشاء الأخير وقصائد أخرى

شعر: سيروان قجو

ترجمة عن الكرديّة: عماد الدين موسى

١- أصابع اليد اليسرى:
إصبعٌ ما يحتضرُ
آخر في غابة التعب
آخر جريح
آخر مكسور
وآخر مشلولٌ تماماً.

٢- اليوم السادس عشر من الشهر:
يضحكُ
يضحكُ
يضحكُ..
سعيداً كان أكثر ممّا ينبغي.
لم يكن يدري أنّ ذلك اليوم
يوم ميلاده.

٣- العشاء الأخير:
دون ارتباك يُذكر
أفرجت عن نهديها
ثمّ دعنتني إلى عشاءٍ حام...
العشاء ذاك كان الأخير.

- سيروان قجو: كاتب وشاعر كردي سوري، من مواليد مدينة عامودا (١٩٨٦)، يُقيم حالياً في واشنطن. صدر له مجموعتين شعريّتين باللغة الكردية، هما: «ذكريات مثلة - ٢٠٠٨» و «أحلام وفودكا وأشياء أخرى - ٢٠١٤» وكذلك رواية باللغة الانجليزية بعنوان «لاشيء سوى الدخان - ٢٠١٥». وصلت روايته إلى القائمة النهائية لجائزة «بفرليهلز» للكتاب في كاليفورنيا، وسبق لقجو أن ترجم كتاب «حديث مع كردي» للشاعر اليوناني أدونيس بودوريس عام ٢٠٠٦.



في الحسكة

المفرقات لعبة الأطفال المفضلة



welatpress2014@gmail.com
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya



العدد (٥٧) ٢٠١٨/١٢/١ م